Brottsoffermyndigheten



# Sûcên nefretê yên îslamofobîkî

Ev namîlke bo ew kesên ku bi mebestên îslamofobîkî rastî sûcên nefretê hatine yan jî di bin xetereya wan de ne. Li vir hûn ê derbareyê tawanên nefretê yên îslamofobîkî, mafên mexdûran, û gilîkirina li nik polîsî çawa dibe û derbareyê piştgirî û alîkariya berdest bêhtir fêr bibin.



# Ma hûn bûne qurbaniyên sûcê nefretê?

Bûna mexdûrê sûcekî dikare bibe binpêkirineke cidî. Mexdûrê sûcê ji ber nasnameya yekî be, ev sûcê hîn girantir dike. Wê hingê dibe ku hûn bûne qurbaniya sûcekî nefretê.

Li Swêdê cudakarî û lêsorkirina neqanûnî, li dijî komên etnîkî wek sûcên nefretê tê dîtin. Lê her tawanek dikare bibe tawaneke nefretê, heger mebesta sûcê binpêkirina nasnameya kesê mexdûr be. Ew dikare li ser van bingehan be:

- rengê çerm
- eslê netewî yan etnîkî
- dîn
- meyla cinsî
- nasnameya transgender / îfade
- yan jî rewşeke din a wek vê.

Ji bo hûn bibin qurbaniya sûcê nefretê, ne hewce ye ku hûn yekê ji nav van koman bin. Bes e ku kesê sûc dike bawer bike, ku tu yek ji van î, mesela ew kes bawer dike ku tu misilman î.

## Sûcên nefretê dikarin cezayên girantir bi encam bikin

Kesê ku sûcê nefretê bike, heger li dadgehê sûcdar bê dîtin, dikare cezayê giran bistîne. Ji ber vê yekê kesê ku, wek nimûne, tehdîd an jî muameleya xirab li kesekî kiribe, ji ber vê yekê dikare bi cezayê girantir were cezakirin, heger ku sûc wekî sûcê nefretê were hesibandin.

# Sûcên nefretê yên li dijî misilmanan

Îslamofobî têgeheke kolektîf e ji bo pêşdarazî û dijminatiya li hevber îslam û misilmanan. Ev bi awayên mîna antîsemîtîzm, biyanofobî û cûreyên din ên nijadperestiyê xwe nîşan dide, bi awayê kiryarên ku hêrîşî mirovan dikin, ji holê radikin an cihêkariyê dikin ji ber ku ew misilman in, an têne bawer tê kirin ku ew misilman in.

Têgihiştineke hevpar ev e, ku sûcên nefretê her gav ji yek bûyereke cidî ya di forma kutan û pînlêdan pêk tê, lê ne hewce ye ku wusa be. Di heman demê de ew dikare derbareyê tehdîd û şîroveyên hêrîşkar be, yên ku pir bi gelemperî têne kirin. Di heman demê de dibe ku kesek di pêwendiya xwe ya bi şîrketekê re yan daîreyeke dewletê re rast li cûdaxwaziyê hatibe.

Gelek mexdûrên sûcên nefretê, bûyer li nik polîsî qet gilî nakin û qet nahizirîn ku gelo bûyer dikare bibe sûcekî nefretê.

# Sûcê nefretê yan cudakarî?

Di axaftina rojane de, peyva cudakarî bi gelemperî bo muameleyên neheq ên cûrbecûr tê bi karhanîn. Lê ji bo li gorî qanûnê cudakarî pêk were, divê muameleya neadil bi yek ji sedemên cudakariyê ve girêdayî be. Di wateya qanûnê de, ew muameleya neadil, dikare wê hingê hem cudakariya neqanûnî û hem jî cudakariyeka li gorî qanûna cudakarîyê be.

Cudakariya neqanûnî sûcekî nefretê ye ku di qanûna cezayê de hatiye tertîbkirin. Dibe ku hûn bûne qurbaniya tawaneke nefretê, heger wek nimûne, hûn ji kirîna tiştekê, yan ji gihîştina cîhekê, yan ji karûbarekî bi heman şert û mercên bo herkesekî hebe, lê gava ji bo we be, hûn hatibin redkirinê. Kesên ku dikarin bi sûcê cudakariya neqanûnî bên mehkûmkirin ev in; xwediyê şîrketan, karmendên xizmetên giştî, nûnerên siyasî û kesên ku kombûnên giştî organîze dikin. Ji bo ku ew mirov were mehkûmkirin, divê ew mirov xwedî niyeta cudakariya li hevber we be û divê "bê gumana maqûl" be ku li hevber we cûdakarî hatiye kirin.

Qanûna cudakarîyê, cihêkarîyê di jiyana kar, perwerdehî û gelek warên din ên civakê de qedexe dike. Ew cudakariya neqanûnî bo gelek rewşan hatiye gotin û ne hewce ye, ku kesê ku bi we re cûda tevdigere bimebest vê yekê kiribe. Ji ber vê yekê hûn dikarin mafê tezmînatê werbigirin, her çend jî ku ew kes niyeta cudakariyê li we nekiribe jî. Bêhtir gelemperî ye, ku sûcên cudakariyê li gorî qaîdeyên derbareyê cudakariya neqanûnî û li gorî qanûna cudakariyê were darizandin.

Derbareyê cudakariyê bêhtir li vir bixwînin: do.se

Heger li hevberî te cudakarî hatibe kirin, tu dikaî serî li Daîreya Polîsê ya Swêdê yan jî  Diskrimineringsombudsmannen (Ombudsmanê Cudakariyê) bidî. Hingê hûn dikarin alîkarî û agahdarî li ser mafên xwe bistînin.

# Ev sûc li ku derê diqewimin?

Sûcên nefretê yên li dijî mislimanan dikarin li her derê biqewimin. Ew dikarin li hawîrdora malê, li dibistanê, li cîhê kar, li Înternet'ê, yan li cîhekî din cih biqewimin. Bo nimûne ew dikare, bi peyvên heqaretan û li otobusan yan li metroyê bi kişandina şara seran, li dikanan û li kuçe û kolanan biqewime. Li ser Înternet'ê, tawanên nefretê yên 'îslamofobîkî bi gelemperî bi sorkirina li dijî komên etnîkî, bi tehdîd û cûreyên din ên tacîzê çêdibin.

Ta ku kesên ne-misilman jî dikarin rastî sûcên nefretê yên îslamofobîkî bên, ji ber ku ew dikarin wekî mirovekî misilman bêne hesibandin, an jî bi kes yan pirsgirêkên misilmanan re wek têkildar bên dîtin. Nimûne bo kesên ku di bin xetereya rasthatina vê reftariyê de bin, dikarin rojnamevan, lêkoler û siyasetmedar bin. Sûcên nefretê yên îslamofobîkî dikarin her wisa li dijî avahî û cihên ku bi misilmanan re têkildar in werin kirin.



# Encamên sûcên nefretê

Kesên mexdûrên sûcan dikarin bi awayên cuda tevbigerin.
Bo nimûne hin kes şok dibin, şikbar dibin û ditirsin, hinekên din jî çi bandorek li ser wan nabe. Li nav demeke dirêj, rûbirûbûna bi vê sûcê, dikare encamên wekî wergirtina îzna nexweşiyê, depresyon û endîşeyan bide. Ev li encama her cûre sûcan pêk tê û girîng e, ku hûn li alîkariyê bigerin heger ku hûn xwe nebaş hîs bikin.

Bûyîna qurbaniyê sûcê nefretê dikare encamên din jî bîne. Kesê ku hatiye mexdûrkirin, ji bo ku careke din mexdûr nebe, dibe ku dest bi veşartina misilmantiya xwe bike, ji hin cihan dûr bikeve, dest ji tevlîbûna karê siyasî û komeleyan berde ku dîsa rasthatina li vê rîskê nebe.  Ev sûc hem bo kesê mexdûr û hem jî bo kesên din ên li hawîrdora wî dibe sedema zêdebûna hesteke bêewlehiyê.

Sûcên nefretê jî ji bo misilmanan bi giştî dibe sedema xirabbûna şert û mercên jiyanê. Dibe ku misilman bibînin ku ew di cîgirtina li civakê û li siyasetê ne xwediyê heman derfetan in. Ji ber hewcedariya zêde ya tedbîrên ewlehiyê dibe, ku civak û komele rast li pirsgirêkên darayî bên.

## Piştgirî û alîkarî

Cûreyên piştgirî û alîkariyê hene, ku hûn dikarin bistînin heger hûn bûne qurbaniya sûcê. Heger hûn diherin dibistanê hûn dikarin serî li servîsa tenduristiyê ya dibistanê yan mamosteyê bidin. Heger hûn kar dikin, hûn dikarin bi kardêrê xwe re yan jî bi serwîsa tenduristiya li ciyê kar têkilî daynin. Dibistan û kardêr mecbûr in ku pêşî li binpêkirinan bigirin û bi pirsgirêkên wan re mijûl bibin.

Hûn dikarin her gav serî li rêxistinên sîvîl ên cihêreng ên ku piştgirî û alîkariyê bikin, mînak Brottsofferjour (Xeta alîkariyê ya qurbaniyên sûcê). Brottsofferjour a Swêdê kesên xwebexş ên ku bi gelek zimanên cuda diaxivin hene û dikarin piştgirî bidin ew kesên, ku baş bi swêdî nizanin an jî ji ber sedemên din dixwazin bi zimanê xwe yê zikmakî piştgirî bistînin.

**Brottsofferjouren (Xeta alîkariyê ya qurbaniyên sûcê).**

Dema ku hûn ji jimara têlefonê 116 006 re telefon dikin, hûn ê karibin bi şêwirmendekî re biaxivin, ku bo piştgirîya zêdetir dê we bigihîne xeta alîkariyê ya mexdûrên sûcê herêmî. Hûn dikarin piştgirî û alîkariyê werbigirin her çend ku we vê sûcê ranegihandiye ji polîsî re û hûn dikarin anonîm (navnenas) bimînin.

Hûn dikarin xwe bigehînin navenda sexbêriya nexweşiyê yan vårdcentral'ê (navenda lênihêrîna tenduristiyê) yan acîlê . Heger hewcedarîya te bi sexbêriyê yan piştgirîyê hebe, tu dikarî serdana vårdguiden (rêberê lênêrînê) 1177.se jî bikî yan jî ji bo şîretan telefon bo 1177 bikî. Baş e ku mirov li tedawiya xwe bigere, her çend ku demek di ser bûyerê re derbas bûbe jî.

Heger tu ciwan bî, bi riya Ungdomsmottagningen'ê (Pêşwaziya ciwanan) û socialtjänsten'ê (Xizmetên civakî) li ew ciyê ku tu lê dijî, mimkun e ku tu alîkariyê bistînî. Li hin şaredariyan jî navendeke piştgiriyê ya bo ciwanên mexdûrên sûcê heye ku hûn dikarin serî lê bidin.

**Socialtjänsten (Xizmetên civakî)**

Socialtjänsten a li şaredariya ku hûn lê dijîn, divê bixebite da ku ew kesên ku bûne mexdûrên sûcê piştgirî û alîkariyê bistînin. Xizmên we jî dikarin ji xizmetên civakî piştgirî û alîkariyê bistînin. Piştgiriya ku Socialtjänsten dikare bide di warê piştgiriya axaftinê û hem jî piştgirîya civakî û arîkariya pratîkî de be.

## Ji kesên derdora xwe alîkariyê bistînin

Kesên li dora we, xizm û heval dikarin bi gelek awayan bibin alîkar. Tiştê ku dijwar xuya dike, dikare hêsantir be heger ku mirov bi yekî re biaxive ku bawerî jê heye. Heger ji bo we dijwar be, dibe ku we pêwîstî bi standina alîkariyê ya ji kesên derdora we hebe, alîkariya bi tiştên pratîkî yên wekî têkilî bi rayedaran re



# Gilîkirina li nik polîsî

Heger hûn bûne qurbaniyê tawanekê yan jî hîs dikin ku hûn hewceyê parastinê ne, divê hûn bi polîs re têkilî daynin.
Bi telefonê 114 14 yan jî biçe qereqolekê ji polîsî re ragihîne.
Ger tehdîdeke acîl be, telefona 112 bikin.

Dema hûn li nik polîsî gilî dikin, girîng e ku hûn bi qasî ku dikarin hemî hûrguliyan bahs bikin. Ne hewce ye, ku hûn bi xwe zanibin ka ya ku qewimiye sûceka nefretê ye yan na, ew kar, polîs û pergala mayî ya dadimendiyê ye ku biryarê li ser bidin. Heger di dema lêpirsîna polîsan de li zûtirîn dem  mebesta  sûcê nefretê were kifşkirin, polîs dikare bingeheke çêtir bide dozger, daku paşê bikare li dadgehê cezayê girantir bixwaze.

Nîşanên ku baş e ku polîs bizanibe:

- Bi karhanîna gotinên îslamofobîkî ya li dema sûcê
- Graffiti, nîşan û sembolên bi peyamên dij-misilmanan.
- Kiryarên berê yê kesê gumanlêkirî, wek nimûne ku wan berê daxuyaniyên li dijî misilmantiyê dane.
- Bûyerên din ên îslamofobîkî yên nû qewimîne yan li nêzîkî

## Xebata polîsî li dijî sûcên nefretê

Polîs dixebitin da ku zûtirîn dem fêr bibin ka li nav sûcê sedemeke nefretê heye yan na. Ji xwe di dema gilîkiriinê de, ji ber vê yekê dê ji we were pirsîn, ka hûn difikirin ku sedemeke taybetî di sûcê sûcdar de heye, bo nimûne nêrînên nijadperestî yan îslamafobîkî heye yan na.. Sedemeke din a ku polîs li ser motîfa sûcê nefretê dipirse ev e, ku polîs bikare di wêneyeke giştî û berfireh de van tawanên nefretê têbigehe. Di nav refên polîsî de vekolînerên taybetî yên sûcên nefretê û pisporên sûcên nefretê jî hene.

**Bîne bîra xwe ku Carinan lêpirsîna polîsan nagihêje wê encamê ku sûcdar ji ber sûcê ku hatiye kirin were darizandin û cezakirin. Ev tê wê wateyê ku ji bo berdewamkirina lêpirsînê û îsbatkirinê ku kî sûcdar e, delîlên têr li ber dest nîn in. Ev nayê wê wateyê ku polîs û dozger ji gotinên we bawer nakin. Gilîkirina we ya li nik polîsî dibe alîkar ku nîşan bide ku ev cûre sûc çiqas berfireh e.**

## Dibe ku mafê te yê tezmînatê hebe

Heger tu bûbe qurbanê tawaneke nefretê, ji bo tazmînata zerarên ku ev tawan daye te, dibe ku mafê te yê tazmînatê hebe. Rastiya ku ev sûc bi sedemeka sûcê nefretê çêbûbe, ev dikare mafê tazmînateke zêde bide te.

### Cûreyên cûda yên tezmînatê

Dibe ku we derfet hebe ku hûn vê bistînin:

- tazmînata bo ziraran ji sûcdar
- tezmînata sîgorteyê ji şîrketeke sîgortayê
- tazmînata zirara sûcê ku ji hêla Brottsoffermyndigheten'ê (Daîreya Qurbaniyên Sûcê) ve tê dayîn.

Herî pêşî li stûyê kesê sûcdar e, ku divê bi riya tazmînatê  zirarên ku ji ber vê sûcê çêbûye bide. Heger tu tazmînatê dixwazî, divê tu ji polîsî re bêjî dema ku tu li ser vê bûyerê têyî guhdarîkirin. Dema ku dadgeh li ser zirarê biryar da, divê sûcdar zirara we bide we. Daîreya Hiczê dikare ji we re bibe alîkar da ku hûn dravên xwe werbigirin.

Dibe ku mafê te bo wergirtina tazmînata sîgorteyê û tazmînata zirara sûcê hebe, her çend jî ku sûcdar ji ber vê sûcê hikum negirtibe yan jî sûcdar nikaribe bi xwe zirara te bide. Pêwendî bi şirket(ên) sîgortaya xwe û  Brottsoffermyndigheten (Daîreya Qurbaniyên Sûcê) re bike da ku bizanin ka di doza we de çi derbas dibe.

## Dibe ku mafê te yê parastinê hebe

Heger tu werî tehdîdkirin an jî bibî qurbana cûreya sûceka din, dibe ku mafê te bo parastinê hebe. Ji ber vê yekê girîng e ku tu ji polîsî re bibêjî ka çi qewimiye û tu xwe ewle hîs nekî û ditirsî ku dibe tu careka din rastî sûcên nefretê bêyî. Polîs nirxandinên rîskê dike û li ser vê yekê piştgirî û parastina muhtemel amade dike.

Her weha hûn dikarin serlêdana bo parastina agehiyên kesane, bo nimûne veşartina navnîşana xaniyê xwe bikin. Agehiyên kesane yên parastî di sê astên cihêreng de têne amadekirin: nîşankirina nepenîtiyê, qeydkirina nifûsê ya parastî û agehiyên kesane yên sexte. Hûn ji bo nîşankirina nepenîtiyê û qeyda nifûsê yên parastî serî li Skatteverket'ê (Daîreya Bacê) ya Swêdê didin. Hûn dikarin ji bo agehiyên kesane yên sexte serî li Meqama Polîsî bidin.

**Bîne bîra xwe ku Sûcên nefretê ne tenê hêrîşa li ser kesê ku mexdûrê sûcê ferdî ye. Ew sînyalan dişîne ji hemî koma ku kesên mexdûr tê de ne û li dijî civaka me ya azad hêrîşek e.**

Hûn dikarin bêhtir agahdarî li vir bibînin:
brottsoffermyndigheten.se

**Agahiyên di vê namîlkeyê de jhatiye wergerandin bo:**

العربية erebî

دری derî

îngilîzî

kurdisya bakur (kurmancî)

فارسی farsî

romanî-arlî - romanî

somalî

سۆرانی kurdiya başûr (soranî)

tîgrînya

tirkî

Brottsoffermyndigheten

Agahiyên di vê broşûrê de jî wiha tê wergerandin:
Telefon: 090-70 82 00
registrator@brottsoffermyndigheten.se
www.brottsoffermyndigheten.se